

mirov dinyayek e û hûn di her mirovên ku dikujin de dinyayekê qetil dikin, ma ev yek dilxweşiyê nade we ku! Ev yek aramiyê nade we ku! Bona di Îsa Mesîhê ku dibêje: **“Bona tu yên ku baweriyê bi min anîne di tariyê de nemînin, ez wekî ronahiyê hatim dinê.”** (KITÊBA PÎROZ, Yûhena 12:46) gehîştina azadî û aramiya rasteqîn ne dereng e! Di bin tîrêjên ronahiya Xwedanî ya Îsa Mesîh diweşîne de dilê xwe ji Xwedê ra vekin, li gunehên xwe mukur bên û bigihêjin aştîya rasteqîn!

Bawer bibe ya mirov, bona tu pengavên ku ji kendalê xelasbûnê, paş ve bête avêtin ne dereng e... Beriya dereng bibe vegerin, beriya dereng bibe, beriya bi kortala mirinê ya abadîn avêtinê, bedenên xwe ji çekên kujer, ruhên xwe ji gemariyê û nefrînê ve paqij bikin, destên xwe ji Xelaskerê Rasteqîn Îsa Mesîh re vekin, lewma hatiye gotin ku: **“Lê belê gava em bêne yên newêrek, bêbawerî, kerax, mêrkuj, yên ku bêexlaqîya cînsî dikin; sêhrkar, senemperest û hemî derewçinan, cihên wan gola agir ya bi kewkurdê dişewite yî. Mirina duyem ev e.”** (KITÊBA PÎROZ, Peyxamgirtin 21:8)

Xwendevanê hêja, ger hûn bixwazin bigihêjin jiyana bêdawî, hûn dikarin duaya li jêr e bixwînin û bi hemûya dilê xwe ji Xwedê re bibêjin.

“Ya Xelaskerê min Îsa Mesîh; ez gunehkarbûna xwe û bona gunehên min, qurbanbûna Te ya li ser darexaçê ye qebûl dikim. Tu Xelaskerê min î! Yê ku jiyana bêdawî dide Tu yî! Niha jî were jiyana min. Û di jiyana min de bibe Xelasker û Rêberê min. Ez bawer dikim ku Te li gunehên min bexşandîye û jiyana bêdawî daye min. Ez heta hetayiyê spasîyên xwe pêşkêşî Te dikim. Amin.”

Xwendevanê hêja, di derheqê vê nivîsa ku we xwendîye de, çî pirs û fikrên we hebe bi nameyekê bigehînin me. Em ê bi dilxweşî bona bersivdana pirsên we bixebitin.

Navnîşana me ev e:
Hoffnung und Leben e.V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld
Germany

Hê zêde dereng nebûye!

Rabe ya mirov! Li derva hin tişt dibin... Hişyar bibin! Tariyek dadikeve rojhelata dinê... Axên pîroz bi xwînê û rengê petrolê ve digemire. Li ezmanan ji ewran bêit jetên baskhesin mirinê dibarînin... Li Behra Egê, masiyan têrî goştê mirovan bûn; şîniya behrê zivîrî geweziya goştê mirovan... Ji penaberan deh hezar zarok wenda ne! Dibêjin ku yan ketine destên bazirganên mirovan yan jî çeteyên lebatfiroşan... Mirovahî diqede, mirovahî wenda dibe!

“Ez yên ku gotinên min bihistine û li gora wan nakin daraz nakim. Ji ber ku ez bona darazîkirina dinê nehatime, lê bona xelaskirina dinê hatime.” (Ji KITÊBA PÎROZ, Yûhena 12:47)

Dîsa Rojhelatanavîn vejeriya avzêlka xwînê! Dîsa li çar alî cangoçkên şer diçingin... Dîsa hin kes li ser navê olê, bi alên reş ve, li her zindiyên ku mîna xwe nafikirin, najîn, ne ji heman nîjadê ne bi serîjêkirinê, bi şewitandinê, li ber kamerayan bi dayîna ber keviran û recimkirinê, vê erdenîgara pîroz bi xwînê ve digemirînin... Dawî bi lezgiyîyek mezin û xewreşiyekê tê. Çawa ku li Îraq û Sûrî ev qas jan û êş û tunebûn têne jiyîn, li Tirkîyê, erdenîgara Kurdan jî di nava geremolek bêwate de tê talan kirin! Fîkr û ramana cehdê ya ku Îslam bi sed salan e toven

Kurdisch (Bewor es zu spät wird!)



wê diçîne, îroj bi şer û pevçûna di nava mirovên ku di heman baweriyê da ne û bi heman Allahî ve dipêstî, bona xwe bi xwe biqelîhînin adetî zivîrî şerekî nijadî. Bi dorpêçkirinên 90 rojî borandine û bi qedexeyên derketina kuçeyan, bi bedenên mirovan ên ku bi rojan li kuçan dimînin, ên bi tangan têne girêdan û ji erdê ve têne kişandin, weşandina wêneyên jinên ku hatine şûtî tazîkirin û avêtine kuçan, di asta civakî... Heftê û heft milyon kesên ku ji gelheya Tirkîyê ya heftê û heşt milyone ye, çavên xwe li van qirêjiyên ku li vê erdenîgarê tete jiyandin digirin, jê wêdetirê, qebûlkirina wan û çepikan li vê hovîtiyê dayîna wan! Hinek xendeq û sedên ku Rêxistina polîtîk ya Kurd digel gelê alî kolane û lêkirine û bi vî awayî miha-cirkirina gelê xwe, ji ber van sedeman dewletê ku serwer jî hewl dide ku avahiya demografîk ya van bajarên biguhere, mîna ku neftê bera ser vî agirê bi can û xwîn ve dişewite hemtayî disekine...

Bo vê yekê Xwedayê Bilind wîsa dibêje: **“Em tevgerên xwe bihêçînin û ji ber çawa derbas bikin, dîsa vegerin XUDAN. Tevî destên xwe, dilên xwe jî ji Xwedayê li ezmanan e re vekin!”** (Ji KITÊBA PÎROZ, Lawijan 3,40-41) **“Werin em vegerin XUDAN. Wî me ji hev kirin, Ew dê qenc bike. Wî me birindar kirin, Ew dê birinên me bipêçîne!”** (Ji KITÊBA PÎROZ, Hoşêa 6,1)

Dîroka hezaran salî, bi dijrabûnên kevneperestî, bi talanan, bi têkbirinan dê tunekirin! Herêmek mezin tete bê nasnamekirin, qiyameta ku li benda hatina wê ye, bi van tahebên mirovî gav bi gav tê nêzik kirin. Bona ku hin mirov di nava firehî û xweşiyê de bijîn, bi milyonan mirov, adetî mîna di bahozekê de mabin ji cih û warên xwe tene ajotin, bi birçîbûnê tene terbiyekirin, rastî tecawizê tene, tene firotan û tunekirin.

Çareserî Çiye?

Li bajarekî ku ji ber bi rojan e ji ber berêdana tang û topan, qedexeyan û dengê guleyan di qeyranê de yî, ji demên ku bi bombeyên gaz û hovîtiyê êrişî her meşê protestoyê kirinê, û ji hewaran û ji janê vê derbasbûyînê, ji siyasetmedarên ku ji ber hêrsa wan şorikên wan dirêje bi derbasbûyînê ve bona pakbûyînê, çareserîya ji van êş û janan, di rojên ku em tê da dijîn de bona ji jan û qede-

xeyan dîn nebin û hiş bernedin û bi dilê xwe vekirinê ve xelas bibin, rêya tekane, Îsa Mesîhê ku dîsa di rojên wek vana de, li Orşelîma ku di bin bana dagirkeran de tevlihev e, bi gotina Navê Bavê Pîroz, rêya bawerî û hezkirinê nîşanî mirovan didan e! Lewma bona Wî: “Di wekî din kesekî de xelasî nîne. Di bin vî ezmanî de navek din nîne ku ji mirovan re hatiye bexşandin û me xelas bike.” (Ji KITÊBA PÎROZ, K. Şagirtan 4:12) hatiye gotin... Di Kitêba Pîroz de bi dehan car hatiye diyarkirin ku rêya xelasiya rasteqîn Îsa Mesîh e... Îsa dema bi gotina: “Bawermend bin û bi ser tirsên xwe ve bikevin!” (Ji KITÊBA PÎROZ, Lûqa 5:1-11; Meta 14:23-34; Meta 26:31-75) destûrê dida, di heman demê de di wê dema kurt ya bi xuyabûna mirovî de hate dinê, ka çawa tirsên xwe bi baweriyê bindest kiriye û li dijî Îblîs û dinê serfiraziyek çawa qezenc kiriye di rê û rêbaza xwe da bi awayekî gelekî aşkere nîşanî mirovan dane. Îsa Mesîh: “Rê, rastî û jiyana ez im” got. “Bêyî navgîniya min tu kes nikare were Xwedê.” (Ji KITÊBA PÎROZ, Yûhena 14:6)

Di roja me da, bi çekan, xendekan, şer û pevçûnê jiyana dinyayî xelaskirin, ji ber pêşveçûna teknoloji û amûrên tevkuştina civakî ev qasî pêşve çûye, çawa ku bêderfet be, di ser de ramana qezenckirina jiyana bêdawîn, çew-tiyek mezin e. Ji ber vê yekê, divê qenc bête fam kirin ku bêyî Îsa Mesîh xelasî bêderfet e û bêyî mukirhatina ku Ew *Xelasker* e, û bêyî bawerî anîna ku Xwedê Wî ji mirinê ve vejinandiye, bi tu awayî xelasî nayê peyda kirin. Dema mirov ji vî alî lê binêre, bona ji hêrs û şerê ku, li herêma me, bajarên me û heta di kuçeyên me da didomin û ji hemî azwêriyên dinyewî pak bûn rêya tekane, guhdarîkirina destûrên Îsa; bawerbûyîn ya xelasî tenê ji Wî tê ye; û zanîna ku rûmeta tekane yê navê “Xelasker” lê ye Ew e, pengava pêşîn ya gehîştina xelasî û aştîya rasteqînê ne!

“Ez ya rast ji we ra bibêjim, jiyana bêdawîn ya kesê bawerî bi min aniye heye. Nanê jiyana ez im.” (KITÊBA PÎROZ, Yûhena 6:47-48)

Wê gavê tu, ya hevalê yê li piştî bendê, di xendeqê de, yê gelê ku li ser navê wî şer dikî ji cih û war kirine û kirine mihacir; ya peywirdarê ku dibêje ez peywirdar im ku, bi çekê xwe biparêzim... Werin û keliyekê bifikirin; her